**K.T**

**ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ**
**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**

**ŞAXA MAKA ZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**TEZA LÎSANSA BILIND**

# BERNAV DI ZIMANÊ KURDÎDA LI GOVERA BADÎNAN

**ŞEMAL EBDULSETAR EBDULKERIM**

**WAN-2018**

**K.T**

**ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ**

**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**

**ŞAXA MAKA ZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**TEZA LÎSANSA BILIND**

# BERNAV DI ZIMANÊ KURDÎDA LI GOVERA BADÎNAN

**Amadekar**

**ŞEMAL EBDULSETAR EBDULKERIM**

**Şêwermend**

**ALK. Dr. Mahmut Dündar**

**WAN-2018**

YÖK watermark

**T.C.**
**VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ**
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANA BİLİM DALI**

**YÜKSEK LISANS TEZE**

# KÜRT DİLİ BADİNİ LEHÇESINDE EDATLAR( ILGECLER)

**HAZIRLAYAN**
**ŞEMAL EBDULSETAR EBDULKERIM**

**DANİŞMAN**
**Yard.Doç.Dr.Mahmut Dündar**

**VAN-2018**

# NAVEROK


KURTE ………………………………………………………………………… vi

ÖZET ……………………………………………………………………...………… vii

ABSTRACT …………………………………………………...…….……..…viii

KORTIYÊN PEVAN ……………………………………………………….. ix

SPASİ ………………………………………………………………...……….. x

PÊŞGOTIN ………………………………………………………..…………. 1

**1. BEŞÊ ÊKÊ BERNAV DI ÇAVKANIYANDA** ………………………….....  3

1.1 Bendê êkê: Bernav û pênase ……………………………......……….…….. 3

1.2 Bendê duwê:Navkirina Bernavî………………………….……………...……. 6

1.3 Bendê siyê:Curên bernavan ……………………………………….….….…... 8

1.4 Bendê care:Erkê bernavî di ristêda ………………………………..…...….. 22

**2. BEŞÊ DUWÊ BERNAV DI GIRÊYA HEVALKARÎDA** ………..….... 28

2.1 bernavên êk pirtik …………………………………………………………….. 31

2.2 Bernavên du pirtik …………………………………………………...….. 34

**3. BEŞÊ SIYÊ BERNAV DI GIRÊYA BERKARÊ NERASTEWXUDA**…39

3.1 bernavên êk pirtik ……………..…………………………………………. 40

3.2 Bernavên du pirtik ………..……………………………………………… 42

**4. BEŞÊ ÇARÊ BERNAV DI GIRÊYA TEWAWKERÎ DA** …………..……..44

4.1 bernavên êk pirtik …………………………………………….……………45

4.2 Bernavên du pirtik ………..……………………………………………… 46

**5. BEŞÊ PÊNCÊ BERINAV DI GIRÊYA KARÊ NESADEDA**……………48

5.1 bernavên êk pirtik ……………………………………………………………48

5.2 Bernavên du pirtik …………..………………………………………………… 48

**ENCAM** …………..…………………………………………………………………. 50

**CAVKANİ** …………………………………………………………………...56

# KURTE

Babetên zimanî yan rêzmanê li dwîv burîna wextî hindek cara guhrîn biserda dihêt. u her kesek li dwîv hizr u bîru buçunêt xwe erkê wan li qelem didet, ev babetejî, babetê bernavî gelek vekulîn liser nehatîne kirin, û digelek pertukanda behis liser nehate kirin, yan dema behis liserkirî, navekê dî bikar înaye. u ev babete bi taybetî di kirmanciya serî da gelek kêm hatiye vekulîn. u jiberku hemî erkên wan navan bi rengekê dirust nehatîne danan ewên li piştî bernavan dihên, me jî bi fer dît ku bi rêkeka pitir zanistî vî navî danîn, û wan erkan diyarbikeyin bvî rengî

Bernav digel girêya hevalkarî.

Bernav digel girêya berkarê nerastewxu.

Bernav digel girêya tewarkerî.

Bernav digel girêya karê nesade.

# ÖZET

Dil ve dilbilgisinde zamanla çeşitli değişmeler meydana gelmektedir.Herkes kendi bakış açısı ve düşüncelerine göre bu değişiklikleri yapmaktadır.Bu konuda da,edat konusunda,çok araştırma yapılmamıştır. Araştırma yapılmışsa da başka isimler adı altında üzerinde durulmuştur.Bu konuda özellikle Kurmanci lehçesinde üzerinde çok az araştırma yapılmıştır. Belki bu edatlardan sonra gelen isimlerin görevleri tam olarak ortaya konmamıştır,biz bilimsel olarak bu isimlerin görevlerini tam ve doğru bir şekilde ortaya koymayı çok önemli gördük. Biz de görevleri şu şekillerde belirledik:

a) Zarf tümleci oluşturan edatlar.

b) Dolaylı tümleç oluşturan edatlar.

c) Tamlama grubu oluşturan edatlar.

d) Birleşik fiil oluşturan edatlar.

## ABSTRACT

Through the passage of time, linguistic or Grammatical topics are subject to change sometimes. Everyone considers the functions of such changes according to his/her perspective. Concerning this topic, preposition (Bernav), It has not been sufficiently researched, and it has been scarcely discussed in books, or even when it was discussed, a different title was given to it. This topic, specifically in Northern Kurmanji, has been rarely subject to researches. Also, because the functions of all such nouns, the ones preceding prepositions, have not been correctly identified, this research found its way to identify this name in a more scholarly method and to identify its functions as following:

- Prepositions preceding adverbial linking.
- Prepositions preceding indirect object of an intransitive verb.
- Preposition preceding object.
- Preposition preceding compound verbs.

## KORTIYÊN PEVAN

| Z | korti | peyv |
|---|---|---|
| 1. | H.K | Hevalkar |
| 2. | H.N | Hevalnav |
| 3. | Ç | Çawig |
| 4. | K.X | Kirmanciya Xarê |
| 5. | K.S | Kirmanciya Serî |
| 6. | C.N | Cihnav |
| 7. | H.K.Ç | Hevalkarê Çewayî |
| 8. | H.K. D | Hevalkarê Demî |
| 9. | H.K.C | Hevalkarê Cihî |
| 10. | G.H.K | Girêya Hevalkarî |
| 11. | G.K.NE | Girêya Karê Nesade |
| 12. | BE.RA | Berkarê Rastewxo |
| 13. | BE.NE.RA | Berkarê Ne Rastewxo |

## SPASI

Gelek spas Bo xodê ew şiyan dane me em berdewamiyê bideyne xandine.

Sopasîyeka bê payan bo mamstayên min li pişka Zimanê Kurdî li Zaningeha VAN Yuzuncu yîl, u ew harikariya wan di gel me kirî bo herdo salan.

Sopasîyeka taybet bo mamosta (Dr. Bayiz) u têbiniyet wi digel min.

Sopasîya Pertûkxaneya Bedrxanîyan dikem jibo dana pertukan bo min.

## PÊŞGOTIN

Gelek ji nivîserên kurdan yan zimanzana ewên pertuk liser rêzmana kurdî danayin yan pertuk liser zimanê kurdî danayin bi navên cuda cuda kitêbên xwe bê behir nekirîne ji babetê bernavî, belê ne bi rengekê berfireh, yan bi hwîrî neçwîne dinav da û behislisernekire, û me nedît weku vekulînek ku ya taybet bît liser vî babetî li cihekî hatibîte belavkirin, û ew nivîserênbehsê bernavî kirîn ne bi vê ramanê û erkan behis kirîne û ev babetejî gelekê kême û babetekê nwî ye dinav rêzimana kurdî da.

• Me babetê xwe bi navê ( bernav di zimanê kurdî da) di ( guvera behdînî) da terxankiriye, lê weku jêder û riste û nimûne me ji hemî diyalêkta wergirtîne badînî û suranî jiberku hindek wek êkin û hindek jî guhrîn têda heye weku (li – le / bi – be) û dibernavên dupirtık da jî me li behdîna (da – ra – ve) yêt heyin û dikirmanciya xarê da ( da - ewe) jî bikardînin li şwîna (ve) û dikirmanciya bakurda li şwîna (da) ew (de) bikardînin. jiber vê çendê nimunên me bi rengekê gişitîne dizimanê kurdîda ewên me ji jêderan wergirtîn, lê li beşên dumahiyê bo nimunan me bitinê liser devera badînî axiftiye û nimune liser înayine.

•Nameya me li ser rêbaza wesfî u şiluvekirinê hatiye çêkirin.

•Hejîye bêjîn ku vekulîna me ji pênc beşa pêk dihêt bivî rengî:

•Beşê êkê: bernav di jêderên berêda.

ku pekhatiye ji çwar benda ewjî bivî rengî:

o Bendê êkê : pênasên bernavî.

o Bendê duwê : navkirina bernavî.

o Bendê siyê : curên bernavan.

o Bendê çarê : erkê bernavan di ristêda.

•Beşê duwê : bernav di girêya hevalkarî da. ku pêk dıhêt ji wan bernavên digel hevalkaran dihên weku (hevalkarê cihî û hevalkarê demî û hevalkarê çeway).

•Beşê siyê : bernav di girêyaberkarê ne rastewxuda. evejî dema dû berkar hatin êk rastewxu û yê dî nerastewxu yan jî dema bitinê berkarê nerastewxudihêt.

•Beşê çarê : bernav di girêya tewawkerîda.

evejî digel karê bêhêz dihêt û ew nave di bine tewawkerê karê bêhêz.

•Beşê pêncê : bernav di girêya karê nesadeda ku eve ewin dema karekê ne sade çê diken ku diçine dibin navê karê aluzda.

li dumahîkê jî encamê vekulînê bo me diyardibît liser navê (bernav).

Ya hejî gutinê ye ku di vê vekulînê da me hemî peyiv weku nav bikar înayine lê di erkî da cuda cuda di hêne bikarînan, bivî rengî ku hevalnav dibinyatê xweda nave lê bu wesfa navekî yan cihnavekî yan tişitekî yan karekî dihêt û hevalkar jî û cihnav jî û çawig jî ku hemî di binyat da navin lê her êk bo erkekî di hêt.

# 1. BEŞÊ ÊKÊ BERNAV DI ÇAVKANIYANDA

## 1.1 Bendê êkê:

## Bernav û Pênase:

Eger em berêxudanekê bideyine jêderên berî nuke ew karên hatîne encamdan liser zimanî yan rêzmanê ewên behis liser bernavan kirîn ku bi gelek rengan hatîne pênasekirin, bivî rengê li xarê diyarkiri:

•NurîAlî Emîn di kitêba xweda ya bi navê (rêzimanî kurdî) libin navê ( amrazê peywendî)[1] dibêjît: ( ew wajeye ku li pêşiya navekî, cihnavekî, hevalnavekî bikardihêt bo derxistina peywendiya wî navî yan cênavî yan hevalkarî digel peyvên dî yên ristê)

•Alan Usman jî dipertuka xweda ya bi navê ( qewa'd alluxe alkurdiye ) û libin navê (amrazê peywest u xistineser)[2]dibêjît: ( ew peyiv u pîtin yê bi karê giringiya grêdanê dinavbera du peyivan yan duristan radbin).

•Muhemmed TahirGuherzî di ktêba xweda (rêzmana kurdî zarê kirmancî ) bi navê (pîtên peywendî)[3]dibêjît (ew peyvin ku çend navan yan ristan pêkve dibînît jiber karekê hev beş dinavbera wan navan yan wan ristanda u dibêjne wan peyvan alav))

•Sadiq BehaeddînAmêdî di kitabaxweda ya bi navê (rêzmana kurdî ya hevberkirî) libin navê (pêrbest)[4]dibêjît: ( bêjeyeke li berî navî yan heval û cihgirên wî tênedanan daku havlî ya wî digel bêjeyên dî di hevekêda diyarbiket).

•Ebdilsitar FetahHesendi kitêba xweda ya bi navê (rêzmanî kurdî) û libin navê (amraz)[5]dibêjît:( pişkeke ji pişkên axiftinê, anku amraz peyiveke, u peyiv jî kumeka dengên watadare, belê bitinê ew ramane dernakevît belkodiristêda u jilayê peyivên ristê run dibît û wataya ristê jî bi rêka amraza derdikevît).

herdîsan bi navê amrazî peywendî dibêjît: ( peyiveke diristêda li pêşiya navekê yan cênavekê yan hevalnavekê bi kardihêt, bo derxistina peywendiya wî navî yan cênavî yan hevalinavî digel peyivên dî yên rstê)

•Viyan Silêman, libin navê (vewjartina amrazî ji murfimêt xizimetguzarî ) ko navê vekulîna wê ya derçunê ye, u bi navê (pêşpirtik û paşpirtik)[6] dibêjît (bi harîkariya nav û hevalnav û hindek hevalkarên sade, hevalkarên darêtî çê diket).

---

[1]Nurî Alî Emîn, rêzmanî kurdî, çapa siyê, çapxana hîvî,hewlêr, 2013, la199.
[2]Alan Usman, qewa'd alluxe alkurdiye, çapxane nîne, 1992, la34.
[3]Muhemmed Tahir Guherzî, rêzmana kurdî zarê kirmancî, çapxana xebat, dihok, 1999, la151.
[4]Sadiq Behaeddîn Amêdî, rêzmana kurdî ya hevberkirî, çapxana dar şion, çapa1,bexda, 1987, la423.
[5]Ebdilsitar Fetah Hesen, rêzimanî kurdî, çapxana hawar,dihok, 1996,la101.
[6]Viyan Silêman,vewjartina amrazî ji murfimêt xizimetguzarî, vekulîna derçûnê,zaningeha dihok, 1998, la29.

- û li cihekê dî bi navê (amraz)[1]dibêjît:( pêk hatiye ji murfîmeka xizmet gûzarî ko erkê wê girêdana beşên pêkhênerên ristê ne).

- Herdîsan li cihekê dî bi navê (amrazê peywendî)[2]dibêjît:(ew curê amrazî ye ku bi erkê girêdana beşên risteyeka sade radibît).

•Bavê Nazê di kitêba (rêzimana kurdî tiyurî u piraktîk) libin navê (daçek)[3]dibêjît: ( ji beşê axftinê yê alîkare diristê de udibîte derbirîna pêgirêdana navî û cênavî û hejmarê bi peyivên dî ve, kengî ew pêgirêdane bi beşên serbixwe di ristêda radibît riste xemleka watayî distînît).

•Ebdilwahid Muşîr dizeyî , di kitêba(rêzimanî kurdî)da u bi navê (amraz)[4]dibêjît: (huyeke bo gehandina mebest ugrêdana peyivên nav ristê li dwîv pêdiviyatiyê).

•Ibrahîm Ezîz Ibrahîm, dikitêba xweda ya bi navê (amraz di zimanê kurdîda) u bi navê (amrazê peywendî)[5]dibêjît: (di zimanê kurdîda kumeka amrazan hene dinav rista sadeda bi kardihêt û peywendiyê dinavbera dupeyivên diristêda paydadiket).

•Nerîman Ebdulla Xuşnaw, di kitêba xweda ya bi navê (rêzmanî kurdî) bi navê (pêşbend)[6]dibêjît: (beşeke ji beşên axftinê, ko bi tinê bikar nahên belkû pêdivî bi kerestên dî heye bo hindê kû watayê bidet, jiberku pêşbend di binyatê xweda ramana cihî u arastekirinê di gehînît, belê her ramanê nagehînît, pêşbend diristêda li pêşiya navekî yan cênavekîdihêt bo pêşandana peywendiyê dinavbera wî navî yan wî cênavî digel navekê dî dinav ristêda).

•Refîq Mihemmed şiwanî, dinameya xwe ya dikturayê da bi navê(amrazî bestinewe le zimanî kurdîda) ulibin navê (amrazî peywendî)[7]dibêjît: (beşekê serbexuyê axftinê ye, udipêkînana ristê da rulê xwe dibînin û peywendiya navî û beşên dî yên axftinê bi pêkve girê didet, û bi zûrî ji layê binyatê xweve dizimanî da diserbexune).

•Lijna ziman û zanistên kurî zaniyarî kurd[8], di babetê rêzimana axftina kurdî da bi vî rengî rengî pênasa amrazî kiriye û dibêjin: (ew beşê axiftinê ye kû hebûna serbexuya heyi, uramana wê digel peyiveka dî derdikevît û peywendî dinavbera nav û hevalnav digel beşên dî yên axiftinê pêk dênît di darişitina ristê da).

•Piştî me pênasên bernavî dayine diyarkirin, bome gelek curên pênasan diyarbun bi gelek rengan. gelek nivîseran bivî rengî gutiye ko li pêşiya navekî yan cihnavekî yan

---

**[1]Viyan Silêman,jêderê berê, 1998, la33.**
**[2] Her ew jêder, 1998, la33.**
**[3]Bavê nazê, rêzmana kurdî, tiyurî û praktîk, çapxanahawar, dihuk, 2012.la119.**
**[4]Ebdilwahid Muşîr dizeyî, rêzimanî kurdî, çapa êkê, 2014, la74.**
**[5]Ibrahîm Ezîz Ibrahîm, amiraz di zimanê kurdîda, 1967, la28.**
**[6]Nerîman Ebdulla xuşnaw, rêzmanî kurdî, çapî hewtem, hewlêr, 2015, la123.**
**[7]Refîq Mihemed Mihyedîn şiwanî, amirazî bestinewe le zimanî kurdîda, slêmanî, 2003, la47.**
**[8]Lijna ziman û zanistekan, rêzmanî axawtinî kurdî, guvara kurî zaniyarî kurd, 1978, la304.**

hevalnavekî dihên u wesa daye diyarkirin ku peywendiya wan nav u cihnav u hevalnavan digel hindek peyivên dî yên ristê diyardiket yan pêve girê diden lê çu kesê bi dirustî u têru timamî pênase nedaye bernavan ji berko çi kesan heta nuke bernav ji amraz u zaravên dî cudanekirîne, ji bervê çendê ew pênasên berî nuke hatîn diyarkirin wek heviyeka heyi dinavbera wanda u jilayekê dîve cudahiya hey, çinko her êkî li dwîv bîrubuçunêt xwe bernav înayine u navek danaye ser u pênasek li dwîv wan bernavan daye babetê xwe yê wan navkiri u wan bawerî pê heyi u li dumahiyê jî u li dwîv bawerya em geheştînê u me bernav ji amraz u murfîmên dî u nîşanên regezî u xistine serê cudakirin, me bivî rengî bernav pênasekiriye :

(Bernav ew pişka axftinê ye ya ko hindek ji pirtekê u hindekên dî ji du pirtan pêk dihêt u dikevne ber navekî yan cihnavekî yan hevalnavekî yan hevalkarî yan çawgekî yan jî digel karê nesade di hên u bume girêya hevalkarê cihî u demî u çewayî ugirêya berkarê ne rastewxu ugirêya tewawkerî u karê ne sade çê diken).

## 1.2 Bendê duwê:

## Navkirina Bernavî:

- Bernav dinav jêderanda bi gelek navan hatiye navkirin her êkî li dwîv hizra xwe navek bo deynaye, u hindek jî çav li hindekên dî kiriye bo navkirinê, jiberkobernav weko babetekê taybet vekûlîn liser nehatîne kirin, lewa bernav u amraz û furm u nîşanên xistineser û regezî bi rengekê berfîreh hatîne têkel kirin ji layê zimanzanave, ubivî rengê lixarê nav bo bernava hatîne deynandin:

- NurîElîEmînbernav bi (amrazên peywendî)[1]navkirîne.

- Cegerxwînî navê wan kirîye (alav )[2] ku bo amraz û fûrma înaye.

- Celadet Bedirxanî û Rujhelatinasê firensî herdukan bi erebî navkiriye bi navê (hirûf alcer we edewat alrebit)[3] kû bi kurdî (pîtên peywendî û amrazên girêdanê)

- ReşîdêKurd jî navê wan kirîye (pê best û pêwend)[4]

- K.K. Kurdwîv navêwankirîneamrazên (sade û lêkday)[5]

- SalihHisên pişderî jî navê wan kirîye (rabest , peywendî)[6]

- Sadiq Bihaeddîn amêdî navê wan kiriye (pêrbest û peywendî)[7]

- Alan Usman jiberkû pertuka wî bi erebiye, navê wan bi erebî kiriye (hirûf eletif we alrebit)[8]anku pîtên peywendî û grêdanê.

- Muhemmed Tahirguherzî navê wan kiriye (pîtên peywendî)[9]

- Ibrahîm Ezîz Ibrahîm navê wan kiriye (amrazê peywendî)[10]

---

[1]Nurî Alî Emîn, jêderê berê, la199.
[2]Cegerxwîn,Awa û destura zimanê kurdî, Bexda, 1961.
[3]Celadet Bedirxan û rujhelatnasê frenisî ruciye lisku, rêzmana zimanê kurdî diyalêkta kirmancî, çapxana dar el îlim, Oman, 1968, la400.
[4] Reşîd kurd, rêzmana zimanê kirmancî, çapa êkê, dar elkitab Beyrut, 1990, la 109.
[5]K.K kurdwîv, rêzmanî kurdî bekerestey diyalêktî kirmancî û suranî, wergêranî Dr.kurdistan mukiryanî, metbe el edîb elbexdadiye, bexda, 1984.la354.
[6]Salih hisên pişderî, kurtiyek le rêzimanî kurdî, çapxaneyi bexda, bexda, 1985 la110.
[7]Sadiq Behaeddîn Amêdî, jêderê berê, la423.
[8]Alan Usman, jêderê berê, 1992, la34.
[9]Muhemmed Tahir Guherzî, jêderê berê, 1999, la151.
[10]Ibrahîm Ezîz Ibrahîm, jêderê berê, 1967, la28.

- Viyan Slêman jî bi du rengên cuda nav kirîne carekê gutiye (pêş û paş pirtik) û careka dî liser hindekên dî kiriye (bernav)[1]

- Ebdulwahid Muşîr dizeyî navê wan kiriye (amraz)[2]

- Bavê Nazê navê wan kiriye (daçek)[3]

- Ebdilsitar FetahHisên navê wan kiriye (amrazê peywendî)[4]

- Nerîman Ebdulla Xuşnaw navê wan kiriye (pêş bend)[5]

- Seîd Sidqî navê kiriye (amraz)[6]

- Li dwîv vekulîna lijna ziman û zanistî navê wan kiriye (pêşgir )[7]

- Lijna pertuka zimanê kurdî ya rêzmanê navê wan kiriye (amrazên peywendî)[8]

- Lijna disturê zimanê kurdî jî dunav danayine (pêwest û peywend)[9]

- Tewfîq Wehbî û kerîmê eyubî herdukan hindek bernav bi navê (pêşgir )[10] navkirîne

Piştî me jêder têkvedayin bome kumeka navan diyarbu ku hatîne bikar înan weku(amraz, amrazê peywendî, pîtên peywendî, alav, pîrbest, pêwend, pêş pirtik û paşpirtik, bernav, daçek, rabest,pêşgir ..... ) jibilî ku ewên bi 'erebî nivîsîn û navên 'erebî liser danayin.

Wekî me di pêşekiyê da diyarkiri ku her peyivek di binyatê xweda nave paşî ew nave bo mebestên cuda cuda di hêne bikar înan ku hindek nav her navin û hindek cihnavin ku li cihê navekê dihên û hindek nav bo pesinkirinê di hêne bikar înan ku dibine hevalnav û hindek nav bo pesinkirina karekî di hêne bikar înan û bome dibine hevalkar anku bome cihî û demî û çewayiya rwîdana karî diyardiken û hindek nav jî kar jê çê dibin û dibine jêder û çawig, jiber vê çendê ew pîtên dikevine pêşiya van navan me navê wan kiriye (bernav) û bi bawerya me ev nave bihêne bikar înan başitire ji navên dî yên berî nuke.

---

[1]**Viyan Silêman, jêderê berê, 1998, la39.**
[2]**Ebdilwahid Muşîr dizeyî, jêderê berê, 2014, la74.**
[3]**Bavê nazê, rêzmana kurdî, tiyurî û praktîk, jêderê berê, 2112.la119.**
[4]**Ebdilsitar Fetah Hesen, jêderê berê, 1996, la101.**
[5]**Nerîman Ebdulla xuşnaw, jêderê berê,la123.**
[6]**Seîd Sidqî, muxteser herif kurdî, Bexda, 1928.**
[7] **Lijna ziman û zanistekan, rêzmanî axawtinî kurdî, jêderê berê,la304.**
[8] **Lijna ziman û zanistekan, rêzimanî axawtinî kurdî, Bexda, 1976.**
[9] **Lijna desturî zimanî kurdî, hendê le babete wuşedarekan le rêzmanî kurdî da, Bexda, 1985.**
[10]**Tewfiq wehbi, destori zimami kurdi, Bexda, 1929. La18.**

## 1.3 Bendê Siyê

## - Cûrên bernavan:

Bernav jî bi gelek curan di jêderên berê da hatîne, her nivîserekî li dwîv boçûnêt xwe u li dwîv jêderên berî xwe cûrên bernavan dayine diyarkirin, weku bome bivî rengî diyar di bît:

- Celalet Bedrxan û rujhelatinasê firenisî ruciyelisku ev bernave înayine:

(bi , bê , di , ji , li )[1]

paşî paşgirê wan jî daye diyarkirin ku evene (de , re , ve)

û herêk daye digel êkê.

(di----- de)

(ji----- re)

(bi----- ve)

paşî behsê (mirekebat hiruf alcer) kiriye bivî rengî:

biser ----- de

biser ----- re

bi bin ----- re

û bivî rengî dabeşkirîne.

1- ber

Diber malade darek heye.

diber ------ re

diber ----- ve

jiber ----- re

jiber ----- ve

li ber --------

ber bi min ve hat.

---

[1] **Celadet Bedirxan û rujhelatnasê frenisî ruciye lisku,jêderê berê, 1968, la406.**

2- bê

bê leriz û tirs.

3- bi

bi ------ de

bi ------ re

bi ------ ve

4- jibo

Ez dê jibo zaruyên xwe bixebitim.

5- di ------

vî kevçî di şurbê meke.

di ------ de

di ------ re

di ------ ve

6- ji ------

ji ------ de

ji ------ re

ji ------ ve

7- li

Gurgîn li male.

- Salih Hisên Hesen pişderî jî ev curêbernavîlibin navê amraz înayine[1]:

bo

ji

li

bi

---

[1]**Salih hisên pişderî,jêderê berê, 1985, la110.**

- Sadiq Bihaeddîn Amêdî[1]bi navê pêrbestên xurî ev curên bernavan înayine:

bi

di

ji

li

bê

bo

bi      Serdarî bi destê xwe name nivêsî.

di      şagird di dersxanê da runişitî ye.

Jibo    jibo te çibikem ziyan nine.

- Alan Usman jî bernav bi van cura înaye[2]:

(bê) libin navê (edewat elîstisna) înaye

u pîta (e - i) kirîne (edewat elnisbe)

u ev bernavên dî kirîne (hiruf alcer)

bi

ji

li

di ------ de

bo

jibo

û wesa diyarkiriye heker di gel hindek amrazên dî bihên dê hindek ramanên nwî den bivî rengî:

bi + re

ji + re

di + re

---

[1]**Sadiq Behaeddîn Amêdî, jêderê berê, la423.**
[2]**Alan Usman, jêderê berê, la34.**

di + de

ji + de

bi + de

bi + ve

ji + ve

Û liser pîta (li) diyarkiriye ku digel hindek hevalkar û navên cihan dihên ku ramaneka berfirehtir diden weku : li kur , li vir , li wir , liser , libin , linik , lipêş ....

- Reşîdê Kurd jî li bin navê amraz jî ev cure înayine[1].

li

bi

ji

di

re

û curê pêrbestê eve înayine .

bo

bi

di

ji

re

jibo

- Min qelemek ji kurê xwere kiri.

dema du pirtik bi hevra dihên kiriye pêrbest.

- K.K kurduwîv jî libin navê (amrazê sade beşê êkê) ev bernave înayine:

**li**

[1] **Reşîd kurd, jêderê berê, la109-112.**

ji

di

bi[1]

Paşî gutiye bi lêkdana amrazê beşê êkê û duwê amrazê (cut) dirust dibît weku:

(diser , jiber , li jêr)

- Muhemmed Tahir guherzîjî bernav bi du curan înayine bivî rengî:

1- (pîtên pê best) ewjî eve înayine:

bi

li

ji

di

U wesa diyarkiriye ku pîta (bi , li) bi duşêwa dihête nivîsîn heker merem jê birgek bît ya serbexu dê cuda hêt weku :

Şureş bi tivengê bi tinê sernakevît.

Belê heker ne birgeka serbexubît dê bi peyivê ve hête nvîsîn weku

Pirs û slavêt hemiyan bigehîne.

2- Bernavê (bo , ju) libin navê alavê taybetmend kiriye curekê dî.

› sêv bo min jî bote.

- Viyan Silêman jî bernav bi du rengan biaer înayine

1- pêş pirtik û paş pirtik:

pêş pirtik kirîne çar[2]

bi

di

ji

li

[1]**K.K kurdwîv, jêderê berê, 1984, la 354-359.**
[2]**Viyan Silêman, jêderê berê, 1998, la39-45.**

paş pirtik kirîne sê:

da

ra

ve

› Bapîrî li şevên zistanêda çîrûk digûtin.

› Ew dinav baxçeyi da bû.

› Bi jurda kire xar.

û dibêjin jibo sivik kirinê hindek caran bes pêş pirtikdihêt û paş pirtik nahêt ku wata nahête guhurîn belku diyardeka funetîkiye.

nimûne: Bi pêşve were. :Pêşve were.

Di bera burî.  : bera burî.

2- Bernav:

ku ewjî evên lixarê înayine:

bi

bo

ji

li

bê

e

weku:

- Min bi pênusî name nivîsî.

- Wî diyariyek bo şirînê kirîbû.

- Min gul ji wî wergirt.

- Bê te naçim.

- Ezdê çime seyranê.

- Bavê Nazê jî di pertuka xweda bi navê (daçek) bernav kirîne pênc cur weku:

1. wareyi ← li male.

2. demehî ← li ber êvarî.

3. egerî ← ji ber sermê nexweş ket.

4. armancî ← jibo ku bixwîne, çu zankuyê.

5. wêneyî ← bê xwestek dice kar[1].

paşî dabeşî ser du kuma di ket, û ewên dibine bernav kirîne bin kuma êkê ku ewjî evene:

bi

ji

di

li

paşî dibêjît sê daçekên serekî bi pirtikin bi vî rengî:

bi – re ← bi hevalê xwere.

di – de ← dihundirde.

ji – ve ← ji wî alî ve.

û dibêjît (l) bê pirtike.

- Ebdulwahid Murşîrdizeyijî bernavkirîne du cur :

1. amrazên awelkarî weku :

le

be

bo

2. amrazên lêkdiraw weku :

le ------ da

le ------ ra

le ------ we[2]

---

[1] **Bavê nazê, *rêzmana kurdî*, jêderê berê, la119.**
[2] **Ebdilwahid Muşîr dizeyî, jêderê berê, 2014, la74.**

- NurîElî Emînjî ku bi kirmanciya xarêbehis jê kirînebernav bivî rengî kirîne çend cur:

1. amrazên peywendî yên sade weku:

(be , le)

2.amrazên peywendî lêkdraw ku peywendî bi babetîve nîne.

paşî ev amraze jî înayine:

bo

be

le

e

bê[1]

bo nimune:

1. Le silêmanî eçim bo hewlêr.

2. Le rêyi weten be merdî mird.

3.Erwate naw mal.

4. Bebê êwe tawê helnakem.

- Nerîman Xuşnaw jî di kitêba xweda her liser kirmanciya xarê çar bernav înayine libin navê pêşbend ku ewjî evene:

be

le

bo

e

weku:

- Azad deçêt bo zanku.

- Firukekan be asmanda desurênewe.

- Şêrzad le tu deçêt.

[1]**Nurî Alî Emîn, jêderê berê, la199.**

- Azad deçête zanku[1].

- Doktur Ibrahîm Ezîz Ibrahîm jî her libin navê amrazê peywendî ku girêdayine bi kirmanciya xarêve ev cure înayine :

bo

e

le

be

- Min çum bo bazar.

- Min çume bazarî.

- Newzad le salar natirsêt.

- Min be êwewe serberzim[2].

- Refîq şiwanî bernavlibin navê (amrazê peywendî) ev cure înayine:

bo

be

le

û gutiye hindek caran ev amraze paşgu digel dihêt bivî rengî:

bo ← ewe

be ← da

be ← ewe

le ← da

û ev amraze jî hemî kirîne dibin navê (amrazên peywendî yên sade)[3]

paşî gutiye eve amrazên peywendîne yên êk erk û ev amraze kirîneamrazên serbexu.

---

[1]**Nerîman Ebdulla xuşnaw, jêderê berê,la123.**
[2]**Ibrahîm Ezîz Ibrahîm, jêderê berê, 1967, la28.**
[3]**Refîq Mihemed Mhyedîn şiwanî,jêderê berê, la47-49.**

- Lijna disturî ya zimanê kurdî ev çend bernave bi navê peywest û peywendî înayine :

le

be

bo

- Min le nanekem xward.

- Min le hewlêr da ejîm.

- Min le hewlêrewe hatm.[1]

- Tewfîq Wehbî dibêjît (bê) pêşgire û heker digel navî hat dê kete (h . n) û (be) kiriye pêşgir ku diçîte ser navî û dikete (h.n)

bi aga , be cerg , be kelk , berv

- Kerîmê Eyubî û î.A. Semîr tuva diktêba (diyalîktî kurdî mukiri) dibêjît :(bê) dikevîte ser navî û hevalnava dikete nefî weku:

(bê hêz , bê kes , bê xeyal , bê şuwên)

- Lijna Kitêbê ya rêzmana kurdî ev curên bernava înayine[2]:

be

bo

le

e

i

- Ebdilsitar Fetahbi navê amrazên peywendî hindek bernav înayine weku:

1. bo =Gelawêj deçêt bo lade.

2. be=Rehim be peçkey mar nakirêt.

3. e=Ew hate jurê.

4. bê=Bê tu jiyanim jane.

---

[1]**Lijna desturî zimanî kurdî, jêderê berê, 1985.**

[2] **Lijna ziman û zanistekan, *rêzmanî axawtinî* kurdî, jêderê berê,la305.**

5. le ------ =çulekem ledest firî.

le ------ da=Le mangî ayindeda dêm bo latan.

le ------ ewe=Emru le malewe ebim.[1]

- Nıvîser (xal) di ferhenga xweda dibêjît :( be ) navî dikete (h.n) bêku nimunekê bînît.
- Ewrehmanî Hacî Marif dibêjîtpêşgirê (be) diçîte ser navî û dikete (h.n)u (h.k) weku: begur , bekul , betenya
- lijna vekulîna ziman û zanistekan libin navê pêşgir ev bernave înayine

be

bê

le

bo

- Be brayî pêt delêm.

- Bê tirs û leriz çume jurê.

- Lecê , Le pêş.

- Boçun , Bozanîn.

Piştî me curên bernavan di nav jêderanda dîtîn, heker em sehkeynê gelek cur bo me diyarbun û pitirya wan jî hindek wek hev yêt heyin.

• Celalet bedrxanî ta radeyekê baş bernav înayine belê dabeşkirina wî bi rengekê wesa nebuye ku di rêkxistî bin, ewên pirta duwê werdgirin me sê hene di bine pirta duwê ewjî evene (da , ra , ve) û navbirî ev hersêke dayine digel (b , û , j) û ya dirust ew hersê wan hersêka wernagirin bi timamî ewjî dê di beşên bihên da bo me diyarbît digel nimunan. û navbirî behsa (î , e) nekiriye û çi amaje pê nedaye.

•Herwesa Salih pişderî jî amaje nekiriye bernavî (î , e , d) û behis li wan nekiriye dema pirta duwê dihêt.

•Sadiq bihaeddîn jî amajenekiriye (î , e) û behisliser wan nekiriye yên pirta duwê werdgirin.

[1]**Ebdilsitar Fetah Hesen, jêderê berê, 1996, la101.**

•Alan Usmanî pîta (î) weku amraz înaye lê ne ew bernave yê peywendî bi babetê me yê bernav ve hebît digel pîta (e) belku eve înayine ku dibine amrazên xistineser

•Reşîdê kurd jî amaje nedaye (v , î , e) ku evejî her bernavin.

•herwesa Tewfîq wehbî dibêjît (le) bome navê cihî çê diket weku

leban , leberamber , lekin , ..........

herwesa k.k kurduwîv (e , î , bo , vi) behis nekire, û behsa wan jî nekiriye yên pirta duwê jî digelda di hên.

•Muhemmed tahirjî hizra (e , î , vi) nekiriye, û nekiriye digel wan bernavan yên wî înayin û herwesa behis li wan jî nekiriye yên pirta duwê digelda di hên.

•Viyan Silîman jî bernavên xwe kirîne ducur û yabaştire kirbane êk û dîsan bernavê (î) digel yên dî neînaye.

•Bavê Nazê herwesa amaje nekiriye (e , î ) zêdebarî ku kirîne pênc cur lê ew curejî hemî jilayê çendîn bernavan dirust dibin, belku her curek wî bi bernavekêve girêdaye ewjî ya xelete belku ew cure hemî hevalkarin u dabeşkirina wî jî ya bernavên dupirtik neya temame belku ya bi kêmasiye.

•Ebdulwahid Muşîr bi tinê sê bernav înayine ewjî di grêdayine bi kirmanciya xarêve û behisliser wan jî nekiriye yên têkel digel kirmanciya serî bitinê (bo) tê nebît.

•Nurîelî Emîn jî bitinê liser yên kirmanciya xarê nivîsîne û behsa (î) nekiriye û heta behsa wan jî nekire ewên pirta duwê werdgrît.

•Nerîman Xuşnawjî û îbrahîm ezîzî behis li yên êk pirtik û du pirtik nekiriye bitinê behsa çar bernavan kiriye û behsa (î) jî nekiriye.

•Refîq şiwanî bitinê amajekiriye sê bernavan digel paşguyên wan û behsa (e , î) u yên kirmanciya serî nekiriye.

û Lijna disturî ya zimanê kurdî bitinê sê bernav înayine digel sê ristanbitinê, ne behsa (î , e)kiriye û neya paşkuyan nekiriye.

•Tewfîq wehbî û kerîmê eyubî bitinê behsa (bê) kiriye bêku amajê bidene bernavên dî.

•Lijna kitêba rêzmana kurdî wekî yên dî behsa (î) nekiriye û behsa wan nekiriye yên pirta duwê werdgirin.

•Ewrehmanê hacî marif û xal herdukan bitinê behsa (be) ya kirî û nezêdetir.

·Ebdulsitar fetah jî ne behsa (î) kiriye û ne behsa wan kiriye ewên di bine dupirtik belku bitinê digel (le) înayine.

•Lijna vekulîna ziman û zanistî jî bitinê çar bernav înayine bêku (î , e)behis biken , u yên kirmanciya serî behis nekirine.

Piştî me raw buçunêt hemiyan diyarkirin çu kesê bi drustî behsê bernavan hemiyan nekiriye, yan bitinê behsa yên kirmanciya xarê yên kirîn, yan jî bitinê behsa bernavekî yan duwa yan sêyan yên kirîn û çukesê behsa bernavê (î) nekiriye.

û heker em bihên bernavan bi drustî rêzbikeyin dê bivî rengî bin:

yên êk pirtik û du pirtik ku evene:

1. Li
2. di
3. ji
4. bi
5. vı
6. e
7. bo
8. î
9. bê

yên du pirtik û du pirtik ku evene:

10 di _ _ _ da

di _ _ _ ra

di _ _ _ ve

11. bi _ _ _ da

bi _ _ _ ra

bi _ _ _ ve

12. ji _ _ _ da

ji _ _ _ ra

ji _ _ _ ve

13. vi _ _ _ da

vi _ _ _ ra

vi _ _ _ ve

ku eve hemî dê dibeşên duwê  û siyê û çarê û pêncê da bi nimuneve behis liser keyin.

## 1.4 Bendê Çarê.

## Erkê Bernavî di ristêda.

Heker em sehkeyine jêderên rêzmanî ewên babetê bernavî têdaheyin hindeka behsê erkê wan peyivan yê kirî ewê li piştî bernavan di hên û hindekan jî behsê erkê wan nekiriye, li dwîv jêderên liber destê me heyin dê wan erkan deyine diyarkirin.

- Reşîdê Kurd dibêjît piştî pêrbestê bo me berkarê ne êkser dirust dibît û bi dîtina wî pêrbest jî evene :

li

bi

ji

di

re

vê nimunê di înît:- min qelemek ji kurê xwere kirî.[1]

ku divê ristêda (ji - re) pêrbestin û (kurê xwe) berkarê ne êksere, ya hejî gutinê ye ku navbirî bitinê erkê berkarê ne êkser înaye û behis li çi erkên dî nekire.

- K.K Kurdwîyiv jî ev bernave înayine.[2]

li

ji

di

bi

ûdibêjît eve bome cihê tişitî yan rwîdanê diyardiken bêku amajê bidete çi erkên dî yên rêzmanî linpişt bernavan, yan çi cure peyivêli pişt wan bernavan dihên.

- Alan Usman jî piştî kumeka bernavan di înît bitinê amaje daye pîta (li) û gutiye digel hindek hevalkar û navên ciha dihên û ramaneka berfirehtir diden weku:

[1]**Reşîd kurd, jêderê berê, la108.**
[2]**K.K kurdwîv, jêderê berê, 1984, la 319.**

- li kur , li bin , li pêş[1] .... .

- Bavê Nazê jî çendîn nimune înayine, lê ne li dwîv bernavan, belku li dwîv wan curên wî dest nîşan kirîn bivî rengê li xarê.

1. Di hundirde.

livêrê diyarkiriye ku bome hevalkarê cihî hatiye piştîbernavî.

2. Li ber êvarî.

û li vêrê jî diyarkiriye ku piştîbernavî hevalkarê demî hatiye.

3. Ji ber sermê nexweş ket.

ku li vêrê jî hevalkarê egerî diyarkiriye.

4. Jibo ku bixwîne, çû zankuyê.

û li vêrê jî armancî nîşan kiriye.

5. Bê xwestek diçe kar.[2]

ku li vêrê jî (nîşan kirinê wêneya karî) diyarkiriye.

- NurîElî Emînjî bivî rengî erk daye bernavan:

1. - (bo) ku bo diyarkirina cihî dihêt weku. = Le slêmanî eçim bo şeqlawe.
   - (bo) bo demî dihêt. = Emane bo maweyekî tir hel egrim.
   - (bo)bo meremê dihêt. = Bo xwêndin hatwîn bo êre.
   - (bo) bo xaweniyê dihêt. = Eme bo min eweş bo tu.
   - (bo) bo texesus dihêt. = Em mere bo daşit danrawe.

2. (be) ev bernavejî bo çendîn erkan înaye weku:

① bo demî weku › Be roj erwîşitîn.

② bo cihî weku › Be naw baxekeda esuranewe.

③ bo swêndî weku › Bexwa natwanim carê sertan lê bidem.

④ bo hal weku › Duwênê bedil şikawî gerayinewe.

[1]**Alan Usman, jêderê berê, la34.**
[2]**Bavê nazê, *rêzmana kurdî*, jêderê berê, la119-120.**

⑤ bo kemiye weku › Le Silêmanî genim berbe efruşin.

⑥ bo mîqdar û nirx weku › Be çend.

3. (le) evejî çendîn erk liser wergrtîne weku:

① bo cihî weku › Le golzara , leser çaweyi behara...

② bo demî weku › Le mangî ayindeda dêm bo latan.

③ bo tenfîl weku › şêr le piling azatire.

④ bo sebeb weku › Le xuşî da wextabu şamerg bibim.

⑤ bo beyanî jimare › Weku leheşt keweke, çwariyanim serbrî.

4. ( e ) evejî înaye bêku amajê bidete hindê ka çi tişt li piştî wî bernavî dihên bitinê nimune înaye weku: › erwate naw mal.

5. (bê) evejî bitinê nimune înaye weku: bebê êwe tawê hel nakem.[1]

- Nerîman Ebdula xuşnaw jî bernav înayine û bitinê erkê berkarê nerastewxu dayê weku divan nimunenda:

›Azad deçêt bo zanku.

›şêrzad le tudeçêt.

›Firukekan be asmanda desurênewe.

belê dibêjît heker jimare yan hevalnav piştîbernavî hat dê peyva didîvda şinî bîte berkarê ne rastexu weku :

›Awaz le yekem jur danîştuwe = jur : berkarê nerastewxwe.

›Awaz le cwantirîn jur danîşituwe[2]= jur : berkarê nerastewxwe.

- Refîq şiwanî erkê bernavan di ristêda bivî rengî behis kiriye ku di çine ser (nava , h.n , h.k , c.n) û girêya peywendiyê pêk dînin û di bine girêya h.k û h.n û girêya karî û girêya navî, û wesa diyar diket ku girêya navî di ristêda erkê berkarê nerastewxu di bînît digel tewawkerê beyarîde weku:

›Îşeket bo pare bû. ← girêya karî

›şitekan be min bû. ← girêya karî

---

[1]**Nurî Alî Emîn, jêderê berê, la201-205.**
[2]**Nerîman Ebdulla xuşnaw, jêderê berê, la123-124.**

›Bawkim le kwê bû.   ← girêya karî

›Ême lewê buwîn.  ← girêya karî

›Min betenya nustim.   ← girêya karî

û bo girêya navî ev riste înayine:

›Karekem be avêsta kird.

›Kitêbekem bo hawrêkem hêna.

›Lebirakem pirsî.

paşî amaje daye girêya (h.k.d)  û (h.k.c)  û (h.k.ç)

weku:

›Le şarî kerkuk da kardekat.    g.h.c

›Bo serewe deçim.    g.h.c

›Wênekem be dîwarekewe helwasî.                    g.h.c

›Tarîkayî mang le êwarewe diyare.    g.h.d

›şanugeryeke bo hefteyi ayinde îş dekat.  g.h.d

›Xelk be êwaran deçine derewe.  g.h.d

›Min bo nextî pare helinaxeltînim.girêya hevalkarê rade

›Mindalekan be kemêk pare razî debin.girêya hevalkarê rade

›Zur le kem başitire.             girêya hevalkarê rade

›Min bizimarekem be çekuş helkêşa.   girêya hevalkarê egerî

›Cutiyarekan le ber tu hatine.   girêya hevalkarê egerî

› ême bexwêndin serdekewîn.[1]girêya hevalkarê egerî

ya hejîye bêjîn ku nivîserî amaje nedaye yên dupirtik û dîsan amaje nedaye erkê (e , î ) û erkê bernavî di girêya tewawkerîda û rista ne sadeda behis nekiriye.

[1]**Refîq Mihemed Mhyedîn şiwanî,jêderê berê, la83-86.**

Lijna Vekulîna ziman û zanistekan erkê van bernavan diyarkiriye bitinê:

be

bê

le

bo

û bivî rengî nimune înayine û dibêjît :

( bê ) digel navî di hên û peyiveka nwî da dirêjît û bahra pitir hevalnavin weku:

(bê hêz , bê pare , bê bak , bê kes)

- dema digel navê me'newî dihêt (h.k) çê diket weku :

›Bê tirs û leriz çume jurê.

›Bê pirs destim daye kitêbeke.

( be ) lijne dibêjît pitirya vî pêşgirî digel navî dihêt û peyvên nwî çê di ken weku (h.n)

( be cerg , be hêz , be gur , be dil)

- dema digel navê me'newî dihêt (h,k) çê diken weku:

›Bexuşî birdmaneser.

›Bebirayi pêt delêm.[1]

(be ) pişikdariyê di çêkirina karê lêkdayi da diket weku: bexêwkirin , besergirtinewe , beserçun)

nivîserî liser herdu bernavên (bê , be) dibêjît ji layê me'nayêve beruvajî êk û dune weku:

beyare × bê yare

be hêze × bê hêze

bekar × bê kar

[1] **Lijna ziman û zanistekan,jêderê berê, la384-392.**

û dibêjît merc nîne di hemî haletanda beruvajî êk bin weku:

Berê kirdin ← bê rêkirin

Bexêwkirdin ← bê xêwkirdin

Be xêr ← bê xêr

(bo) lijne bi navêpêşgirî dibêjît dikevîte berî navekî û erkekê dî di bînît weku:

boçun , bonaw , bozanîn , ....

(le) liser vî bernavî lijne dibêjît eve pişikdariyê di van navada diket:

1. Navê me'newî ← lebar , lepir , le mêj

2. Navê madî ← lecê , lerû

3. H.k.c. û h.k.ç ← le pêş , le ser , lepir

4. Karê nesade ← leber rwîşitin , lebarçun

Liser van bernavan ku hindek jê dikêmin weku yên (k.s) û (î , e ) û ev bernave bo me (h.n) çênaken li dwîv buçuna nivîseran, belku dikevine ser (h.n) û ew h.n erkekê dî dibînît weku (g.h.n) yan tewawkerî û amaje nedaye çêkirina tewawkerî û berkarê nerastewxu belku bitinê amajekiriye (h.k.c) û (h.k.ç) û (karên nesade).

## BEŞÊ DUWÊ

## BERNAV DI GIRÊYA HEVALKARÎDA:

Eger em bihên û sehkeyine jêderên berê evên me bikar înayin ka her kesekê çewa bernavdigel grêyên hevalkarî bikar înayine dê bome run û aşkirabin bivî rengî:

Alan usman diyarkiriye ku hevalkar û navên cihan Li pişit bernavî di hên li dwîv rista wî înay:

li kur

li pêş

Ya hejî gutinê ye ku nimuna wî ya diriste belê bitinê amaje daye navên cihan û bitinê nimune bo wan înaye û behsa hevalkarê demî û çewayî nekire û behsa hemî bernavan jî nekire.

Bavê Nazê jî bi dirustî liser hemî bernavan ne axiftiye û bitinê çendek înayine û kirîne pênc cur bvî rengî:

1.bo hevalkarê cihî wî ev riste înaye:

- Di hundirde.

wî bi dirustî înaye lê bernavê wî ji du pirtika dihêt (di + de) û di babetê xweda wî behis li vê çendê nekire belku bi tinê behsa (di) kiriye.

2.ya duwê bo hevalkarê demî înaye li dwîv nimune wî:

- li ber êvarî.

Nimuna wî ya dirste ku piştî bernavî wextek hatiye, lê bo hevalkarê demî jî bitinê wî bernavê (li) înaye û behsa yên dî nekire.

3.nimuna dî jî behsa hevalkarê egerî kiriye bi vê ristê.

- ji ber sermê nexweş ket.

Ya baştirbu kirba çewayî çinku me hevalkarê egerî nîne, ku em dişên bêjîn çewa nexweş ket? bersiva wê dê bîte ji ber sermê.

4.u li rista çarê jibu armancê înaye bivî rengî :

- jibu ku bixwîne, çu zankuyê.

ya başitirbu rista xwe bi diristî nivîsîba bivî rengî :

- jibo ku ew bixwîne, çu zankuyê.

Li vêrê jî (ew) di kevîte piştî bernavî û nakevîte di bin hevalkarîda.

5.uli rista dumahiyê bu nîşankirina wêneyakarî înaye ev riste .

- Bê xwestek di çe kar.

Li vêrê jî xwestek nakevîte bin çi curên hevalkarî belku di bîte berkarê nerastexu

Nurî Alî Emîn çend bernavek yên kirmanciyaxarê înayine û erkê wan peyva diyar kiriye ewê di kevte piştîbernavî û jiberku babetê me bitinê li serbernavên kirmanciya serî ne dê bitinê behsa wan nimuna keyin ewên bernavê me û kirmanciya xarê êk bin weku:

1.bo ← bo hevalkarê cihî înaye weku:

› Le silêmanî eçim bo şeqlawe.

← bo hevalkarê demî weku:

› Emane bo maweyekî tir hel egirim.

ev herdû ristên wî didirstin, belê hersê ristên dî ne dirustin ku evene:

① bu meremê eve înaye ← Bo xwêndin hatwîn bo êre.

Li vêrê xwêndin nahêt bo meremê çinku me ev hevalkare nîne belku di bîte berkarê nerastewxu.

② bo xaweniyê ev riste înaye ← Eme bo min ewîş bo tu.

Li vêrê (min + tu) ev herdûkejî her di bine berkarên nerastewxu.

③ yadî jî bo texesusê înaye weku = em mere bo daşit danrawe.

ku li vêrê jî (daşit) her di bîte berkarê nerastewxu û van hersêka çi peywendî bi hevalkaranve nîne.

2.( e ) ev bernave înaye li dwîv rista wî bivî rengî : › Erwate naw mal.

lê diyar nekire ku hevalkarê cihî Li pişt vî bernavî hatiye.

3.(bê) û bo vî bernavî jî ev nimune înaye : › Bê êwe awê helnakem.

Livêrê (êwe) jî dîsan di bîte berkarê nerastewxu û nabîte hevalkar.

Hejiye bêjîn ku (le + be) em bikar naînîn lewa me behisliser nekir jiberku di kirmanciya serî da (li + bi) bikar dihên.

Nerîman Ebdula xuşnaw jî li dwîv ristê bitinê gutiye berkarê nerastewxu, û ya dirust ristên wî hevalkarê cihî têdaye û berkarê nerastewxu.

› Azad deçêt bo zanku. = zanku di bîte hevalkarê cihî.

› Firukekan be asmanda desurênewe.= (asman) jî her hevalkarê cihî ye.

› Awaz leyekem jûr danîştuwe.

Livêrê jî (jûr) kiriye berkarê nerastewxu, belku ya dirist (yekem jûr) bi pêkve di bîte hevalkarê cihî.

›Awaz le cwantirîn jûr danîşituwe.

Livêrê jî (jûr) kiriye berkarê nerastewxu, lê ya dirust (cwantirîn jûr) bi pêkve her di bîte hevalkarê cihî, çinku di herdu ristanda di bine bersiva pisyara kîve anku awaz li kîve danîştîye.

di raw buçunêt çuyî da çi kesê bi hwîrî û timamî û dirustibehisliser wan bernavan nekiriye ka ew kîj bernavin bome hevalkaran çê diken.

belku dê livêrê li dwîv bernavan rêzkeyin ka çend bernav bome hevalkaran çê diken û her bernavek çend hevalkaran çê diken.

## Ew bernavên bome girêya hevalkaran çê diken evene:

**êk/ bernavên êk pirtik:**

1. li

2. dix

3. ji

4. bi

5. e

6. bo

7. bê

8. vi

**du / bernavên du pirtik:**

1. ji _ _ _ da

   ji _ _ _ ve

ji ------- ra x

11. bi _ _ _ da

bi _ _ _ ra

bi _ _ _ ve

12. di ------ da

di ------- ra

di ------- ve

13. vi ------ ve

vi ------ ra

vi ------ da x

## 2.1 bernavên êk pirtik

êK: ( li )

1. eve bome hevalkarê cihîçê diket weku:

Li milekê kuştine, li mila dî serşwîşitine. peyiveka sadeye

Em liseyrangehê runşitîn. peyiveka darjtî

Demê linav diwanê rwînişţî, cihê xwe neveguhêze. peyiveka lêkday

Divan ristan da peyiva (milekê , miladî ,seyrangehê , diwanê) di bine navên cihan

anku hevalkarê cihî kevtiye piştî bernavî û bwîne girêya hevalkarî.

2. bome hevalkarê demî çê diken weku:

Libuharabo min gulî.

Lisala 1991 serhldanê destpêkirbû.

Divan ristandajî peyiva (buhar , sala 1991) di bine dem û di bine bersiva kengî, ankudigelbernavê (li) bome girêya hevalkarê demî yên çêkirin.

DU: (ji)

ev bernavejî bome hevalkaran çê diken

1. hevalkarê cihî weku:

› Me ji baxçeyi gulek bese.

› Kabanî ji navbîstanî derkeft.

Divan ristanda peyivên (baxçe , nav bîstan) di bine cih û digelbernavî bome girêya hevalkarê cihî çê diken.

2. hevalkarê demî weku :

› Eve ji demjimêrheft were ez li hêviya te.

Eve jipar ez dxwînim.

herdû peyivên (dem jimêr heft , par) dibine wext û dibine bersiva kengî û digel bernavê (ji) bome girêya hevalkarê demî çêkirîne.

3. hevalkarê çewayî weku :

› Ji qehra xwe di havêjî behra.

› Ji cwaniyaxwe vira li min didey.

Li vêrê jî peyivên (qehra , cwaniya xwe) bome çewaniya karî diyarkiriye û digel bernavê (ji) girêya hevalkarê çewayî çêkirîne , anku dibine bersiva çewa, weku çewa xwe di havêjî behra , çewa vira li min didey.

Sê: (bi)

ev bernave van hevalkaran çê diket :

1. hevalkarê demi.

› Kes bi salekê nabîte zana.

› Ez bi çar demjimêra digehme wanê.

livêrê (salekê , çar dem jimêra) dibine hevalkarê demi.

2. hevalkarê çeway.

› Bite'da ji kirmancî bistîne, belê bi te'da nede rê.

› Bi axiftina xweş mar ji kunê di hête der.

livêrê (te'da , axftina xweş) çewaniya rwîdanê diyardiket lewa di bine hevalkarê çewayî.

3. hevalkarê cihî.

› Min hemî bi bin êxistin.

› Dê paşê bi serbanî êxim.

livêrê jî(bin , serbanî) hevalkarê cihî ne piştî bernavî hatîn.

ÇAR: (bê)

Eve hevalkarê çewayî çêdiken.

› Ev zelame bêhêz kardiket.

› Hevalê min bêxandin nacih dibît.

› Melayê cizîrî bê çapxane dîwanaxwe çapkir.

› Filanî bê destnivêj quran xand.

PÊNC :( vi)

Ev bernavejî hevalkarê cihî çêdket.

› Runahî zwî vi erdî di kevît.

› Em vi serbanî keftîn.

ŞEŞ: (bo)

ev bernave van hevalkaran çê diket:

1. hevalkarê cihî:

› Em bodihukê hatîn. sade

› Pale bo nav aqarî çun. lêkday

› Nêçîrvan bo berujî serkeft. darjtî

2. hevalkarê demî:

› Ez borujekê dê çim hewlêrê. sade

› Min bo çar heyvan xwe amadekiriye. Lêkday

HEFT : (e)

Evejî bitinê hevalkarê cihî çê diken dema di kevine dumahiya karî û piştî wî navê cihekê dihêt.

› Ez dê çime zankuyê. lêkday

› Zaruk hatine mal. sade

› Mamustayi qutabî birine seyrangehê. darjay

## 2.2 Bernavên du pirtik:

Êk: (ji_ _ _ ve)

van hevalkaran çê diken:

1- hevalkarê cihî:

› Axê ji ser ve rake . sade

› Textî ji bin pêpka ve buyaxke. lêkdar

divan ristanda bome cihê karî diyar buyer.

2- hevalkarê demî:

› Ji evru û paş ve ez nahêm.

› Ji êvarî wê ve dê çîne bazarî.

divan ristanda demê karî diyarbuye.

3- hevalkarê çewayî:

› Min ew ji layê rastê ve girt.

› Wî tirumbêl ji rexî ve de'mand (lêda).

divan ristanda çewaniya karî diyarbuye.

DU: (ji_ _ _ da)

Ev bernavejî van hevalkaran çê diken:

1- hevalkarê cihî.

› Me bermîl jinavda buyaxkir.

› Wî jura mêhvana jinavda şwîşt.

Di van ristanda cihê karî diyarbuye.

2- hevalkarê çewayî:

› Hawlatiya ji keyfa da kire girî.

› Wê ji şerma da ne axift.

çewaniya karî hatiye diyarkirin.

SÊ: (bi _ _ _ ve)

evejî van hevalkaran çê diket:

1. hevalkarê cihî:

› Pêşmerge bi serçiya ve hat. lêkday

› Tevinpîrk bi banî ve çû.

Li vêrê cihê karî hatiye diyarkirin.

2. hevalkarê çeway:

› Ew bihêbetîve hate mal. sade

› Yarîzan bibêhinhilmayive çu. lêkday

divan ristanda çewaniya karî diyarbuye.

ÇAR: (bi _ _ _ da)

van hevalkaran çê diken:

1. hevalkarê cihî.

› Ez bi ser supêda hatim. lêkday

› Ew binavdadiket. Sade

2. hevalkarê çewayî.

› Nameyek bomin bi avê da hat. sade

PÊNC: (bi _ _ _ ra)

Evejî hevalkarê çewayî çê diken.

› Emê bi hev ra çîne seyranê. sade

› Em dê bi hevdu ra planekê danîn. Lêkday

ŞEŞ (di _ _ _ ve)

evejî hevalkarî cihî çê diken.

› Duhî ez di mal ve bum.

› Rundik di jur ve yanivistî.

divan ristan da cihê karî yê hatiye diyarkirin.

HEFT: (di _ _ _ da)

evejî van hevalkaran çê diken.

1. hevalkarê cihî.

› Gerac di nav seyrangehê da kar diket. lêkday

› Masî di nav avê da dijît.

livêrê cihê karî diyardibît.

2. hevalkarê demî.

› Ez dê dirujekêda gehim. sade

› Qutabî di çar salan da zankuyê timam di ket. lêkday

divan ristanda demê karî diyar dbît.

HEŞT: (di _ _ _ ra)

evejî hevalkarê cihî çê diken.

› Min werîs diserbarîra havêt. lêkday

› Ew diserra çu. Sade

NEH- (vi _ _ _ ve)

evejî hevalkarê cihî çê diken.

› Tuviserve hatî.

› Hişiyarbe yê hatiyeviserve.

Li vêrê jî cih hatiye diyarkirin

DEH- (vi _ _ _ ra)

Evejî hevalkarê cihî çêdiken

› Ez vi malên hevalanra hatim, min hemî agehdarkirin.

› Ezê vi hemî jura ra hatîm, heta min tudîtî.

livêrê cih hatiye diyarkirin.

(vi _ _ _ da) nine

# 3. BEŞÊ SIYÊ

## Bernav di girêya berkarê nerastewxuda:

Ev babete gelek kêm hatiye behis kirin dinav jêderanda, em jî dê li dwîv jêder û nimune û cura behisliserkeyin.

heke em seh keyinê (Nerîman 'ebdulla xuşnaw) i ev cure di hindek ristanda înaye, belê wî erkî nabînît weku :

› Azad deçêt bo zanku.

Li vêrê zanku kiriye berkarê ne rastewxu, belê di binyatda di bîte hevalkarê cihî.

› Firuke be asmanda desurêtewe.

livêrê asman kiriye berkarê nerastewxu, belê herdîsan dibîte hevalkarê cihî.

› Şêrzad le tu deçêt.

ev riste ya diruste ku peyiva (tu) kiriye berkarê nerastewxu.

› Awaz le yekem jûr danîşituwe.

livêrê jur kiriye berkarê nerastewxu, belê ya dirust (yekem jûr) bi pêkve dibîte hevalkarê cihî.

.Reşîdê kurd di kitêba xweda ev bernave înayine :

li

bi

ji

di

re

û gutiye bome berkarê neêkser dirust diken û ev nimune înayine :

› Min qelemek ji kurê xwe re kirî.

ev nimune ya diruste, belê nimune bo hemî bernavan ne înayine.

evên me diyarkirin bitinê ewbun liser berkarê nerastewxu axftîn û behsê erkê wan kirili pişt bernavan, em jî dê bi hwîrî û dirêjî di gelnimuna deyine diyarkirin.

Ew bernavên digel berkarê nerastewxu dihên evene :

3.1 yên êk pirtik:

li

di

ji

bi

vi

e

bê

bo

î

3.2 yên du pirtik:

ji ji _ _ _ve

ji _ _ _ra

ji ------ da x

bi bi _ _ _ ve

bi _ _ _ da

bi _ _ _ ra

di di _ _ _ da

di ------- ra x

di ------- ve x

vivi _ _ _ re

vi _ _ _ va x

vi -------- da x

## 3.1 Bernavên êk pirtik.

1) li

› Şivan li pezî di gerha.

› Ez lite di gerham.

› Ew li xerîban bo xudan.

2) ji

› Min çu jite nekirî.

› Ez jiwî venabm.

› Jidarekê sed zilkên şixartê çê dibin.

3) bi

› Min bitekir.

› Me bidadivanî kir.

› Em bi wan di jîn.

4) bê

› Em bête najîn.

› Em bêkewal naqetînîn.

› Ez bê mamusta çume jur.

5) vi

› Tu vimin ketî.

› Tîrek vi dilê wî keft.

6) di

› Ez di babetî nagehim.

› Em di dersê gehiştîn.

› Ew di te negeheşt.

7) bo

› Min namek bo te hinart.

› Me giya bo pezî dirwî.

8)  e

› Ez dê diyariyekê deme te.

› Em dê bo bizna çîne çilî.

9)  î

Bernavê (î) bome berkarê nerastewxu çê diket û dikevîte pêşiya (navî , cihnavî , çawkî) weku divan nimunan da diyar.

hindek kar hene têneperin ku bitinê berkarê (ne.ra) di hên

1. Gazîkirin.

› Wî gazî min Kir.               c.n

› Min gazî zîlanê kir.         nav

› Ewê gazî mirinê diket .    çawig

› Şivanî gazî pezî kir.         navê tşitî

2. Harîkirin

› Me harî te kir.                        cihnav

› Me harî mamustayi kir .           nav

› Wî harî hespî kir.                     navê tiştî

› Me harî vemirandinêkir.           çawig

Hindek kar jî têperin berkarê rastewxu û nerastewxu werdgirin.

3. Fêrkirin.

Eve berkarê rastexu û ne rastewxu werdgirin.

› Min ew fêrîte kir                              cihnav

› Min pişîk fêrî şirînê kir.                     nav

› Min pezê xwe fêrî giyayi kir.              navê gşitî

› Min qutabî fêrî nivîsînê kir. çawg

4. Gurîkirin

› Min riha xwe gurîte kir. cihnav

› Me xwe gurî mamustayi kir. nav

› Min wextê xwe gurî xandinê kir. çawg

› Me parê xwe gurî'erdîkir. navê gşitî

## 3.2 bernavên dupirtik:

1) ji _ _ _ ve

› Yajiteve ez nahêm, padê rawest.

› Jiehmedîve ez dê bo helm.

2) ji _ _ _ ra

› Min qelemek ji te ra kirî.

› Ji dujminê xwe ra mêrbe.

3) bi _ _ _ ve

› Ezê bi te ve çwîm .

› Ew yê bi babê xwe ve çwî.

4) bi _ _ _ da

› Av bi minda rişt.

› Xuh ya bi te da dihête xar.

5) bi _ _ _ ra

› Ezê bi tera hême mal.

› Ew yê bi pezê xwera here gund.

6) di _ _ _ da

› Ez baş di vêşulê da naçim.

› Ew di axiftinêt teda naçît.

7) vi _ _ _ ra

› Kes vi min ra nagehît.

› Ez vi te ra gehişitim.

# 4. BEŞÊ ÇARÊ

## Bernav di girêya tewawkerî da:

Hindî ew jêderên vi dest meketîn û babetên amraza bi hemî reng û cura têda, behisliser nehate kirin, liser tewakerî û çu kesê amaje jî pê nedaye, û ji ber nebuna ristan û nimunen dijêderên kevinda, em dê êkser çîne dinav babetîda û dê li dwîv bernavan rista înîn ka aya kîj bernavdigel tewawkerî dihên:

ÊK// Bernavên êk pirtik ku ewjî evene :

li

di x

ji

bi

vi

bê

bo

e x

Î x

DU// Bernavên dupirtik ewên di hên evene :

1. ji ve

   da

   ra

2. bi de

   ve x

   ra x

3. di ra

   da

   ve x

4. vi    ve

da    x

re    x

## 4.1 Bernavên êk pirtik ewên digel tewawkerî dihên.

1) li

› Parên min li tene.

› Pêşmerge tijî li sengerîne.

› Bîra min dihêt min qerek litebû.

2) ji

› Başî jiteye.

› Hejêkirin ji herdu dilaye.

› Xeletiya 'ewil ji wî bû.

› Rwîdana duhî ji lezê bû.

› Hatina dilupa egerê wê ji banî bû.

3) bi

› Mirina wî bitebû.

› Hatina wan bidestê teye.

› Şufêr gelekê bi leze.

› Ew giyanewer yê bi tirs bû.

› Ahenga wan bişev bû.

› Piling giyanewerekê bi hêze.

4) bê

› Ev zelame yê bê hêze.

› Xarina meya bê xwê bû.

› Xaniyê wan yê bêserbane.

5) vi

› Tirumbêla min vi tebû.

› Her kesekê qehra wî vi wî ye.

6) bo

› Min jî her bo tebû.

› Ew kiras bo sîpelê ye.

› Ew axe bo banî ye.

## 4.2 Bernavên dupirtik ewên digel tewawkerî dhên :

1. ji _ _ _ ve

› Başe bela wî ji te ve bû.

› Qelpên gwîzê ji ser ve ne.

› Cilkên me ji ser ve bûn.

2. ji _ _ _ da

› Birîna wî ji nav da ye.

› Êşana wê ji nav da bû.

› Bersiva min ji leza da bû.

3. ji _ _ _ ra

› Ew diyarî ji te ra ye.

› Kirasê sur ji şirînê ra bû.

4. bi _ _ _ ve

› Gelek tuz ya bi te ve.

› Duhî gelek xuh bi pala ve bû.

› Ew yê bi ser ve ye.

5. bi _ _ _ ra

› Qelemê min biterabû.

› Hevalame binarînraye.

› Em hemî bihevrane.

6. di _ _ _ da

› Masî di avê da bû.

› Hespê me di nav da ye.

7. di _ _ _ ra

› Beraz di nav remlê ra bû.

› Bizmar di pêlava azadî ra ye.

8. vi _ _ _ ve

› Mamosta vi serve bû.

› Qutabî vi ser ve ye.

# 5. BEŞÊ PÊNCÊ

## Bernav  di girêya karê nesadeda:

Ji berku eve babetekê nwî ye bi taybetî digel karî ku di jêderan da nehatiye behis kirin em jî dê êkser çîne dinav babetî da û wan bernavan înîn ewên pişikdarîyê digel karê nesadeda diken bivî rengê li xarê :

**Êk//Bernavên êk pirtik ku evene u bitene ewen sore win yen bikar di hen:**

bi

li x

di x

ji

bo x

bê x

vi

e x

i x

**DU// Bernav ên du prtk ji:**

( di _ _ _ da)

( di _ _ _ ra) x

( di _ _ _ ve) x

( ji _ _ _ da) x

( ji _ _ _ ra) x

( ji _ _ _ ve) x

( v _ _ _ da) x

( v _ _ _ ra) x

( v _ _ _ ve) x

( bi _ _ _ da)

( bi _ _ _ ra)

( bi _ _ _ ve)

Dê di nimunanda bome diyarbît ewên pişikdariyê di çêkirina karê nesadeda di ken.

ji ← Me wanên xwe baş ji ber kirin.

ji ← Ev sale daiş hemî ji nav çun.

ji ← Pêşmergeyi da'iş ji nav bir.

vi ← Xelkê dugunda vi navêkkeftin.

bi ← Em li gencînekê gerhayin hetaku em bi serhilbwîn.

bi _ _ _da ← Bi pilanekê dujminê me bi serdaçun.

bi _ _ _ da ← Piştî ji kestina dujminî me bi serdagirt.

bi _ _ _ ve ← Duhî em pitir bi nikveçwîn.

bi _ _ _ ve ← Ew xarina înayi maweyê wê yê bi serveçwî.

bi _ _ _ ve ← Me simînarên xwe bi rêvebirin.

di _ _ _ da ← Hevalên me behra pitir yê diser daçwîn.

## Encam

**Piştî me vekulîna xwe bi dumahî înayi, em di gehîne vî encamê dumahiyê ku di çend xalekada bome di hête diyarkirin.**

**1. Babetê Bernav î babetekê nwî ye gelek behis û vekulîn liser nehatîne çêkirin û dinav jêderandajî bi hwîrî û dirêjî kesê behis lê nekire.**

**2. Bernav weku babetekê taybet û serbexu ji babetên dî yên wekî amrazî û murfîma û nîşanên regezî û xistineser nehatîne jêk cudakirin belku di têkelkrîne.**

**3. Bernav dizimanê kurdîda (k.s) gelek pitirin jiyên (k.x) bivî rengî.**

**yên (k.x) :**

**( bo , be , le , e , le , le _ _ _ ewe , be _ _ _ ewe , le _ _ _ da , bê )**

**û yên (k.s) jî evene , yên êk prtk :**

**( bi , di , ji , li , li , v , e , bo , bê , yi )**

**û yên dupirtik evene:**

**bi ___ da**

**bi ___ ra**

**bi ___ ve**

**di ___ da**

**di ___ ra**

**di ___ ve**

**ji ___ da**

**ji ___ ra**

**ji ___ ve**

**vi ___ da**

**vi ___ ra**

**vi ___ ve**

**4) Bernav di hêne hijmartin pişkeka axiftinê û bitinê çi ramana naden, belku dema dikevne berî peyvekê rulê xwe dibînin û ew peyvên di dwîvda dên erkên cuda cuda dibînin.**

**5) Bernav bi gelek navên cuda cuda hatiye navkirin weku ( amraz, amrazî peywendî, amrazî peywest, amrazê pêrbest, alav, daçek, bernav, pêşgir, _ _ _ )**

**6) Bernav dikevîte pêşiya navekî yan cihnavekî yan heval navekî yan hevalkarekî yan jî pişikdariyê diket di çêkirina karên nesadeda (karên aluz) yanjî dikevîte pêşiya çawgekî.**

**8) Jiberku hemî peyiv di binyat da navin jiberhndê me navê Bernav hel bijartiye û biker înaye û paşî ew nav erkên cuda cuda di bînin.**

**9) Bernav yê heyi bitinê karekî diket weku (î) ku eve bome berkarê ne êkser çê diket yanijî em dşên bêjîn bitinê dkevîte berî berkarê ne êkser**

**› û Bernav jî heye bi tinê du erk li pşitî wî dihên weku (e) ku ( h . k . c ) û (be . ne .ra)**

**>Bernavên dî jî gelek erk di kevne pişitî wan weku (h.k.c ) (.k.d) (h.k.ç) (be.ne.ra) (be.ra) tewawker, û karê nesade ) û ew Bernavejî evene (di – ji – li – bi – ve - bo – bê ) digel yên dupirtik.**

**10) Ew Bernavên bome grêya hevalkarî çê diken evene:**

**êk/ Bernavên êk pirtik:**

**1. li**

**2. di**

**3. ji**

**4. bi**

**5. e**

**6. bo**

**7. bê**

**8. vi**

**du / Bernav ên du prtk:**

**11. ji _ _ _ da**

**ji _ _ _ ve**

**11. bi _ _ _ da**

**bi _ _ _ ra**

**bi _ _ _ ve**

**14. di ------ da**

**di ------- ra**

**di ------- ve**

**15. vi ------ ve**

**vi ------ ra**

**11) Ew Bernavên bome girêya berkarê nerastewxu çê diken evene:**

**êk// yên êk prtk:**

**li**

**di**

**ji**

**bi**

**v**

**e**

**bê**

**bo**

**î**

**du// yên du prtk:**

**ji ji _ _ _ve**

**ji _ _ _ra**

**bi bi _ _ _ ve**

**bi _ _ _ da**

**bi _ _ _ ra**

**di di _ _ _ da**

**vi _ _ _ ve**

**vi _ _ _ ra**

**12) Ew Bernavên bome girêya tewawkerî çê diken evene:**

**êk// Bernavên êk pirtik ku ewjî evene :**

**li**

**di**

**ji**

**bi**

**vi**

**bê**

**bo**

**e**

**î**

**du// Bernavên dupirtik ewên di hên evene :**

**1. ji ve**

**da**

**ra**

**2. bi ve**

**da**

**ra**

**3. di ve**

**da**

**ra**

**4. vi ve**

**da**

**ra**

**13) Ew Bernavên bome karê nesade çê diken evene:**

**êk//Bernavên êk pirtik:**

**bi**

**li**

**di**

**ji**

**bo**

**bê**

**vi**

**e**

**î**

**du// Bernavên du pirtik:**

**( di _ _ _ da)**

**( di _ _ _ ra)**

**( di _ _ _ ve)**

**( ji _ _ _ da)**

**( ji _ _ _ ra)**

**( ji _ _ _ ve)**

**( vi _ _ _ da)**

**( vi _ _ _ ra)**

**( vi _ _ _ ve)**

**( bi _ _ _ da)**

**( bi _ _ _ ra)**

**( bi _ _ _ ve)**

## CAVKANI:


Ebdilsitar Fetah, ***rêzmanî kurdî***, dihuk, 1996.

Ebdilsitar Fetah û Segvan Cemîl mihemmed, ***rêzman û edebî kurdî***, dihuk, 1998.

Ebdilwahid Muşîr dizeyî, ***rêzimana kurdî***, çapî yekem, 2014.

Bavê nazê, ***rêzmana kurdî tiyurî û piraktîk***, çapxana hawar dihuk, 2012.

Celadet Bedirxan û rujhelatnasê frenisî ruciyelisku, ***rêzmana zimanê kurdî diyalêkta*** *kirmancî*, çapxana dar elîlim, Oman, 1968.

Cegerxwîn, ***Awa û destura zimanê kurdî***, bexda, 1961.

Alan Usman, ***qewa'id elluxe elkurdiye***, 1992.

Îbrahîm Ezîz Îbrahîm, ***amraz di zimanê kurdîda***, çapa êkê 1967.

Îbrahîm Remezan zaxwîy, ***rêzmana kurdî***, çapa êkê, çapxana kulîja şerî'ê, dihuk, 1998.

10- K.K kurdwîv, ***rêzmanî kurdî bekerestey diyalêktî kirmancî û suranî***, wergêranî Dr.kurdistan mukiryanî, metb'e el edîb elbexdadiye, bexda, 1984.

Tewfiq wehbi, ***destori zimami kurdi***, bexda, 1929.

Reşîd Kurd, ***rêzmana zimanê kirmancî***, çapa êkê, dar elkitab beyrut, 1990.

Refîq Mihemed Mihyedîn şiwanî, ***amrazî bestinewe le zimanî kurdîda***, slêmanî, 2003.

Sadiq Bihaeddîn amêdî, ***rêzmana kurdî kirmanciya jurî û jêrî ya hevberkiri***, çapa êkê, çapxana dar elşiun elseqafiye el'ame, bexda, 1987.

Lijna ziman û zanistekan, ***rêzimanî axawtinî kurdî***, bexda, 1976.

Lijna desturî zimanî kurdî, ***hendê le babete wuşedarekan le rêzmanî kurdî da***, bexda, 1985.

Lijna ziman û zanistekan***, rêzmanî axawtinî kurdî***, guvara kurî zaniyarî kurd, 1978.

Muhemmed Tahirguherzî, ***rêzmana kurdî***, çapxana kameran, slêmanî, 1960.

Nurî Elî Emîn, şêx mihemedê xal, mihemed mustefa, kamil besîr, ***rêzmanî kurdî***, bexda, 1964.

Nurî Alî Emîn, ***rêzmana kurdî***, çapxana kameran, slêmanî, 1960.

Nerîman Ebdulla xuşnaw, ***rêzmanî kurdî***, çapîhewtem, hewlêr, 2015.

Salih hisên pişderî, ***kurtiyek le rêzimanî kurdî***, çapxaneyi bexda, bexda, 1985.

Seîd Sidqî, ***muxteser herif kurdî***, bexda, 1928.

Viyan Silêman, ***vewjartina amrazî ji murfîmêt xizmet guzarî***, vekulîna derçunê bo bekaluryusê, zankuya dihuk, kulîja adabê, 1998.